Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1273 | 14-Gulan-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Mirov bi çand û zimanê xwe tê naskirin

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Rêveberiya Giştî ya Çand û Hunera Dicle ya bajarê Dêrikê Şemal Reşîd diyar kir ku pêwîst e her kes xwedî li çanda xwe derkeve, ji ber ku mirov bi çand û zimanê xwe tê naskirin.**

Çand û Hunera Dicle bi awayekî fermî di sala 2011'an de hat vekirin. Komên ku di çand û hunerê de cihê xwe digrin, du komên giştî yên muzîkê hene bi navê koma Cûdî û koma Ciwanên Cûdî. Di heman demê de 3 komên xweser jî hene bi navê; koma Yesna, koma Eleftêriya û koma Avaşîn. Her wiha koma şano bi navê Koma Ava Mezin jî heye. Koma zarokan jî heye bi navê Kulîlkên Rojava û koma Kevneşopî jî heye him dengbêjî him jî bi govendên xwe cihê xwe di çand û hunrê de digrin.

Di derbarê kar û xebatên Çand û Hunera Dicle ya bajarê Dêrikê Rêveberiya Giştî ya Çand û Hunera Dicle ya bajarê Dêrikê Şemal Reşîd ji Rojnameya me re axivî.



**Kar û xebatên Çand û Hunerê**

Şemal Reşîd da zanîn ku karê çand û hunerê karekî bingehîne di nav civakê de, ji ber ku mirov bi çand û zimanê xwe tê naskirin û wiha got:" Em jî wek navenda Dicle kar didin meşandin da ku em êş û zehmetiyên gelê xwe ragihînin. Gel heta çi astê karîne çanda xwe nas bikin û biparêzin. Di heman demê de ev çanda ku heta roja îro hatî parastin jî bi saya kesayetên ku kevneşopî dane meşandin e. Mînakên ber bi çav jinên xwedî gewdeya hunerî wek Eyşeşan, Meyrem Xan û bi hezaran jinên dengbêj karîne çanda xwe biparêzin. Di dema niha de jî gel hewil dide çanda xwe biparêze, ji ber ku dema em çanda xwe winda bikin em jî wenda dibin. Pêwîste em çanda xwe pêşbêxin û di nav gelên din de jî çanda xwe bidin naskirin çi di milê govend, cil û berg, kevneşopî û dengbêjiyê de."




Şemal Reşîd di berdewamiya axaftinên xwe de wiha got: "Raste heya astekî ev çand hatiye parastin, lê pêwîste bêtir ked were kirin ji ber ku piraniya gelê kurd çanda xwe ji bîr kirin di milê cil û bergan de, dema şahiyek li dar bikeve divê her kes bi çil û bergên xwe yên kurdî tev bigerin. Ev erk ji çand û hunerê tê xwestin ku gel qani bike da ku her tim bi cil û bergên xwe serbilind bin. Di heman demê de kesên ku berê xwe didin çandê jî pêwîste ji çandê fêm bikin û nas bike da ku bikaribin xwe pêş bixin. Ji ber ku heger em karê çandê nasnekin em nikarin vî karî bidin meşandin. Her wiha ji bo pêşxistina endamên çand û hunerê her heftê rojek ji bo perwerda fikrî heye, di milê kar de jî komên me xwe bixwe fêr dikin, di her komekî de mamosteyek heye li ser komê disekine ew jî cihê xwe di komê de jî digre."

**Berhemên çand û hunerê**

Şemal Reşîd diyar kir ku çand û hunerê ji beriya Şoreşa Rojava heya niha hijmareke mezin ji berheman derxistiye û wiha got:"Tevî ku berhemên yekane Çand û hunerê elbomek ji 12 stranan jî qeyd kiriye. Navê berhemên çandê ev in; Çarê Nîsanê, Zeriyê, Evdîşo, Jîna Emînî, Kobanê, Azadiyê, Şehîd Bedran, Ava Mezin, Şervano, Heftenîn, Felaketim, Apo Newroz e, Darbesta Şehîd, Kurdistan, Destar Dîsa Geriya, Dahola Cengê, Pîroz be Rojava, Ocalan, Kevneşopiya PKK'ê, Gêrîla, 19'ê Tîrmehê Sirûda Şoreşê, Em li virin û ji virin, Şengal û hwd…"

**Astengiyên li pêşiya kar û xebatên çand û hunerê**

Rêveberiya Giştî ya Çand û Hunera Dicle ya bajarê Dêrikê Şemal Reşîd axaftinên xwe bi dawî kir û wiha got:" Astengiyên ku rastî me tên ew e ku kesek berê xwe bide çandê û ji karê çandê famnake, em rastî vê yekê tên û dema ku em mamûsteyekî bînin da ku korsan bide zarokan, ew kom pêş nakeve û em restî astengiyan tên. Di heman demê de dema şahî li bajaran lidardikevin daxwaza komên me dikin, di vir de em astengiyan dibînin, ji ber ku di demeke tenig de dibêjin û derfet nîne ku kom xwe bighînin her derî, heger dispilîn û birêxistinkirin di navbera me û bajaran de hebe wê ev astengî werin derbaskirin. Her wiha dema kom bi hevre derdikevin cihên cuda û ji ber ku amûrên me yên muzîkê kêmin û di vî warî de jî em astengiyan dikşînin. Herwiha em kêfxweş dibin dema ragihandin dema xwe dide me, karê me dişopîne û ji derdorê re radighîne, em bihêvîne ku derengî çênebe û dema çandê berhemek nû derxist ji hêla wan ve were belav kirin."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Guhqul e:**
- Jîr e; jêhatî ye; tiştan zû dibihîze Guhê wî qul e.
- Bi heman wateyê.

**Guhên wî dilepitin/guhên wî dilîzin:**
- Pir jîr e; wirya ye; biaqil e.

**Genim biavêje ser latê şîn dibe:**
- Jîr e; jêhatî ye; ji kar pir baş fêm dike.

**Gepa xwe ji devê gur derdixe:**
- Jîr e; jêhatî ye; kêrhatî ye; afrîner e.

**Gerînekên wî di binê behrê de ne:**
- Destê wî dirêje; têkiliyên wî xurt in; jîr e; jêhatî ye.

**Golikan delav ji ga standiye:**
- Dema yên piçûk ji yên mezin, yan yên xizan ji yên dewlemend diborin hingê tê gotin.
(Delav: Cihê heywan avê lê vedixwin)

**Gur û miyan bi hev re diçêrîne:**
- Pir jîr e; di xapandina mirovan de jêhatî ye.

**Her mûyek ji riha wî şeytanek di bin de ye:**
- Keysbaz e; jîr e; jêhatî ye; nayê xapandin.

**Hesin dikute/asin diqute:**
- Jêhatî ye; kar pê dibin; kar ji destê wî tên.

**Hêkan biçembil dike:**
- Pir jîr e; tiştek ji ber destê wî nafilite.

**Jê re kab nayê avêtin:**
- Ti kes pê nikare; pir jîr û jêhatî ye.

**Ji bêvila şeytên ketiye:**
- Nehs e; jîr e; şûm e.

**Ji bin derxist:**
- Wisa kir heta ku tiştên xwe yên bi dizî eşkere kirin.

**Ji bin ve çûyê:**
- Xwe pir baş jê re amade kir.
- Bi hosteyî bi zanebûn ji bin derxist.

**Ji bin ve girt:**
- Xwest koka mijarê fêr bibe; xwest ji bin derîne.

**Ji difna şeytên e:**
- Pir jîr e; serê wî pir dixebite.
(Dema behsa xirabiya yekî tê kirin hingê tê gotin)

**Ji kokê ve girt:**
- Bi heman wateyê.

**Kêçê lixab dike:**
- Pir jîr e; ti kes nikare bixapîne; ti kes xwe nagihîne qama wî.

**Kuncirik li mitirban dane:**
- Pir nehs e; şeytan e; jîr e; nesekinî ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Bestasûs

## Aboriya Jin; têkoşîna li hemberî astengiyan



Jina ku beriya Şoreşa Rojava ji cewherê xwe hatibû dûrxistin, îro rê li ber civakeke komînal û demokratîk vekiriye. Xebatên aborî ku di bingeha xwe de bi destê jinê bû û ji ber berovajîkirina dîrokê rola wê hatibû windakirin, bi şoreşê re ber bi cewherê xwe yê rasteqîne ve çû.**R-2**

## Di 28'emîn bîranîna komkujiya Hewlêrê de, PDK'ê ji hesabxwestinê li ku ye?

Hewlêra Kurdistanî bûye şahidê pilan û sûcên dîrokî yên PDK'ê û Tirkiyê li dijî Tevgera Azadiya Kurdistan û gelê Kurd. Gelo Komkujiya 16'ê Gulana 1997'an li dijî Gerîlayên Azadiyê, rewşenbîr, rojnamevan û welatparêzan wê ji bîr bibe?**R-5**



## Dîroka qirkirina gelê Kurd Serhildana Agirî û Geliyê Zîlan (1)




Serhildanên Agiriyê navê çend serhildanên rêxistin û eşîrên Kurdan e ku di salên 1926'an -1930'î de li derdora Çiyayê Agiriyê û li Rojhilatê Kurdistanê pêk hatiye. Ev bûyer di dema 1929'an de tevlîhev bûn û pereyê ku serhildanê bi dawî bike hate xerckirin û mezaxtin, lewra bû sedema aloziyê li Komara Tirkiyê.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1273 | 14-Gulan-2025 | www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

# AZADIYA RÊBER APO AZADIYA ME YE

Rêber Apo bi fikir û ramanê xwe ji destpêka avakirina PKK'ê ve heyanî îro nefes bi nefes di serî de jin û civak ji koletiyê rizgar kir; jina Kurd jî vîna xwe ji fikir û felsefeya Rêber Apo girtiye. Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêwîst e ku di serî de jin û tevahiya civakê di nava têkoşînê de bin, ji ber ku azadiya Rêber Apo azadiya mirovahiyê ye.**R-4**




## Li ser zimanê Kurdî hin rist û gotin...




Zimanê Kurdî ji bo hemû qadên civaka Kurdî bi nivîskar, rewşenbîr, zimanzan, dîroknas û hwd ve stûneke serke ye. Lewma jî her kesayeteke ku xwedî hizrekî Kurdî ye gotin û ristên nirxdar li ser zimanê xwe anîne ziman.**R-7**

## Dorpêçkirina Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî plana dewleta Tirk a dagirker e




Endama Komîteya Perwerdê ya Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) Leyla Îlhan diyar kir ku dema em temaşeyî rewşa Îraqê dikin bê guman em nikarin ji rewşa Rojhilata Navîn ya heyî qut bigrin dest û wiha got: "Têkiliya di navbere Îraq û Tirkiyê de yê ku du dewletên dagirker in, li ser Kurdistanê heman polîtîkaya dagirkeriyê didin meşandin."**R-6**

**Hevalê min!** — Nehîr pale — R-2

**Berxwedana dîrokî ya PKK'ê derbasî qonaxeke nû dibe...** — Zekî Bedran — R-5


**Partiya Karkerên Kurdistan** — Farûk Sakik — R-5


**Cejna Zimanê Kurdî..Ne Rojeke, Hemû Rojên Salê** — Kemal Necim — R-7

# Aboriya Jin; têkoşîna li hemberî astengiyan

**Jina ku beriya Şoreşa Rojava ji cewherê xwe hatibû dûrxistin, îro rê li ber civakeke komînal û demokratîk vekiriye. Xebatên aborî ku di bingeha xwe de bi destê jinê bû û ji ber berovajîkirina dîrokê rola wê hatibû windakirin, bi şoreşê re ber bi cewherê xwe yê rasteqîne ve çû.**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

"Ekonomî" têgeheke Yewnanî ye ku tê wateya "aboriya malbatê" ango aboriya malê û rêbaza jiyana malbatê û çawaniya peydakirina debara wê diyar dike. Aborî wek pêkanîna pêwîstiyên madî yên girîng ji civakê re pênase dike. Li ser vê bingehê jinan dest bi lêgerîna rêbazên vegera aboriyê li cewherê wê yê rasteqîn kir ku aboriya komînal bingeh digire. Avakirina sîstema aborî ya nû di gelek pêvajoyan re derbas bû û di avakirina wê de gelek zehmetî hatin dîtin ango ji cewherê xwe hatibû derxistin. Bi şoreşa Rojava ango şoreşa jinan re, jinan gava yekemîn a ji bo pêşxistina aboriyê li gorî cewherê wê yê rast avêt.

### Beriya şoreşê rola jinan sînordar bû

Beriya şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmeha 2012' an de rola jinan sînordar bû. Jinan tenê karên malê bi rê ve dibirin. Vê rewşê jî derfet nedida ku rola xwe ya dîrokî di nava civakê de pêk bînin. Yekîtiya Star ku piştre veguherî Kongra Star wek pêngava yekemîn a ji bo pêşxistina aboriya jinan dest bi avakirina komînên jinan kir. Ji wê derê dest bi avakirina komîteyên aborî, wek yek ji bingehên sereke yên komînê ne, kir. Ev pêngav bingeha sereke ji bo aboriya jinan di nava şoreşa Rojava de bû.

### Pêşxistina aboriya jin gava ber bi civaka demokratîk e

Aboriya Jinan bi armanca berfirehkirina çalakiyên jinan di aliyê aborî de, yekemîn konferansa jinan di 15'ê Hezîrana 2017'an de li kantona Cizîrê li dar xist. Di konferansê de girîngiya avakirina aborî di rewşên şer, pêvajoya heyî de û girîngiya aboriya xweser ji bo şikandina ambargoya ku hatibû ferzkirin, hatin nîqaşkirin. Di konferansê de gelek biryar hatin dayîn, ew jî li ser bingehê pêşxistina aboriya jin bû.

### Komîteya Aboriya jin yek ji komîteyên Kongra Star e

Komîteya Aborî ya jin di sala 2015'an de hate avakirin, ew



komîteyek ji komîteyên Kongra Star e. Xebatên Komîteya Aborî ew e ku perwerdekirin û xurtkirina jinan di milê aborî de ye, herwiha vekirina projeyên xweser bi jinan bi awayekî koperatîv e. Xebatên Komîteya Aborî ya jin bi vekirina projeyên çandiniyê dest pê kir, di destpêka vê xebatê de jî hejmara jinan kêm bû. Lê bi demê re ev proje berfireh bûn, êdî projeyên din hatin avakirin, hejmarê jinan jî li kêlek berfirehkirina projeyan zêde bûn. Di heman demê de cûreyên din ji projeyan, mîna projeyên bazirganî û pêşesazî yên ku bi rengê koperatîv tên avakirin, hatin dest pê kirin.

### Girêdana jin bi axê re

Praniya projeyên Aboriya Jin ji projeyên çandiniyê ne ku bêtir jin xwe tê de dibîne û îfade dike, ew ji ber ku girêdana jina bi axê re ji dîrokê heya niha berdewam e, weke projeya daran a jiyan ku 3 hezar dar lê hatiye çandin, projeya demsal ku tê de cûreyên genim û ceh hatine çandin, beşek jê jî sebze lê tên çandin, ev proje hemû taybet jin tê de kar dikin. Cûreyên din ên projeyan hene weke Werşa Lavîn ku bi destê jina di wir de cil tên dirûtin û di cihên ku girêdayî aboriya xweser a jine têne firotin. Herwiha koperatîvên firnan ango çêkirina nan jî heye ku jin tê de kar dikin. Cihê konsirwa bi jinan jî ew e ku jin rengê koperatîv dide pêş ku tê de xwarinên demsalê çê dike û berhemên van projeyan jî têne firotin. Di heman demê de karkegeha şêranî ya girêdayî jinan jî heye. Bi rêya van projeyan jin xwe bi rêve dibe.

### Aboriyeke xweser bi keda jinan pêş dikeve

Heta astekê aboriyeke xweser bi keda jinan hatiye avakirin, di



nava vê xebata ku tê meşandin jî zor û zehemetiyên jinan heye ku hîna rêngê koperatîva aboriya xweser di nava hemû jinên civakê de nehatiye belavkirin. Lê Komîteya Aborî ya Jin bi hewldanên xwe yên ku bi rêya komînan hewcedariyê jinan bi çi koperatîv an jî projeyan heye ku bê avakirin, pêk tînin. Di heman demê de hewldan hene ku hîn bêtir projeyên jinan werin pêşxistin.

### Jin piştgiriya xwe bi xwe dike

Tê xuyanîkirin ku jin êdî cihê xwe di nava aborî de dibîne, êdî ew piştgiriya xwe bi xwe dike û dibêje; ez karim xwe bi xwe birêve bibim, malbata xwe xwedî bikim, li kêleka mêr malê birêve bibim, cihê min di hemû qadan de heye, bi taybet di qada aboriyê de. Helwest jinan tê xuyanîkirin û hêza wê di aliyê aborî de derdikeve. Ev guhertin jî guhertina sedalê ye.

### Di aboriya Jin de astenî û têkoşîna jin

Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê zor û zehmetiyên jinan di aliyê aboriyê de hene. Ji ber ku rewşa li cîhan, Rojhilata Navîn, Sûriyê û bi taybetî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên jiyanîkirin ji kirîz û şerên heyî, ev jî li pêjiya pêşketina projeyên aboriya jinê dibin zehmetî. Tevî hemû zor û zehmetiyan jî kar û xebatên aboriya xweser a jin berdewam e ku projeyên nû werin vekirin, mîna cihê şûştina cilikan, projeyên dirûnê û projeyên konsirwe li bajarên cûd cûd werin avakirin.

Jin di aliyê civakê de jî hîn zehmetiyan dikşîne ku hîna rêjeyeke ji civakê di bin bandora kefneşopiyan de ye ku dibêje; Jin nikare kar bike, hêza jinê tuneye ji bo karkirinê, jin gereke ya malê tenê be, mijolî xwedîkirina zarokan û xizmeta mêr de be, ev hemû astengiyên li ber pêşketinên jinan ne. Herwiha çiqasî jin xwe di projeyên aboriyê de pêş xistiye, lê ya girîng ji jinan re ew ku xwe bighînin asta pisportiyê, lewra pêwîst e perwerdeyên meslekî ji jinan re bên dayîn, da ku zehmetiyên pêşberî xwe derbas bike. Lê tevî van hemû zehmetiyan jî têkoşîna jin a li heberî astengiyan li pêş e.

Derbarê asta aboriya serbixwe ya jin, endama Komîteya Aborî ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriya Emel Ibrahîm ji Rojnameya me re axivî

Emel Ibrahîm diyar kir ku gavavêtinên biçûk ên jin ji pêşketinên herî mezin ê şoreşê ye û wiha got: "Beriya şoreşê tu rola jin di qada aborî ne xweser û ne giştî de nebû. Rola wê tenê di malê de sînordar mabû, heger jin kar bikra jî weke jineke karker tenê lê dihat nerîn, beyî ku di wî karê ku tê de dixebite xwedî roleke be. Herwiha tu projeyên ku rengê jinê jî bide xuyanîkirin nebûn. Her tim rengê mêr ê desthilatdar di nava civakê û derveyî civakê li pêş bû. Lewra dema em hevrûkirinekê bi rola jin di beriya şoreşê û piştî şoreşê re dikin, em wê gavavêtinê biçûk ên jinê ji pêşketinên herî mezin dibînin, heta ku jin negihaye asta pêşketina tê xwestin, lê tenê proje bi destê jin bê avakirin û ew xwedî rol be, ew pêşketina herî mezin e ya li hemberî hemû kesên ku wê bê hêz û îrade didîtin. Ji ber ku nirxê jinê ji nirxê hemû civakê ye. Têgihştina vê jî, ji bo hemû civakê bi têkoşînê heye."

**Ji Pênûsa Jin**

## Hevalê min!

Nehîr Pale

Berî ku em pênaseya Hevalê min şîrove bikin, em ê balê bikşînin ser pirsgirêka cinsiyetparêziyê. Dibe ku bi kurtasî em bibêjin cinsiyetparêzî tê wateya cûdahiya di navbera jin û mêr de. Têgeh û wateya wê bilêvkirin ne zore lê belê di encama cinsiyetparêziyê de jin di çi şikandinan re derbas dibin ne girînge û pirsgirêka mezin jin ji xwe zêdetir nirx dide mêr û wî weke hevalê xwe pênase dike.

Dema ku jin mêr hevalê xwe dibînin tê wateya ku êşa di encama cinsiyetparêziyê de hîs nakin. Ne bes bû ji mêr re tê gotin bav, bira, kur û hevaljîn niha jêre dibêjin hevalên min. Gelo mêrê ku berhemê cinsiyetparêziyê ye dikare hevaltî bi jinê re bike, yan jî dizane hevaltî bike, pîvan û rêgezên hevaltiya mêr bi jin re wê çi bin?

Pirsgirêka herî mezin pênaseya Hevalê min bi pêşketin û azadiyê ve tê girêdan. Hêdî-hêdî di nava jinan de feraseta jina ku hevalên wê yên mêr hebin pêşketiye, belav dibe. Mêr ji bo bibe heval û dostê jinê divê destpêke têkeve nava lêgerîna xwe ji zilamtiyê rizgar bike. Heyanî niha mêr bi zilamtiyê serbilinde û hewldaneke mezin dide ku bibe mêrê desthilatdar. Mêrê serwer wê çawa bibe heval û dostê jinê? Ev pênase ne li ser bingehê azadiya jin tê kirin berevajî li dijî jinê ye, têkoşîna jinê lewaz dike û dibe sedema parçebûna di navbera jin de.

Civaka cinsiyetparêz di mijara jinê de çi di xwe de daye guhertin? Hîna di bin navê parastin û exlaq de tûndî li jinê tê kirin, tê qetilkirin û hebûna wê tê inkar kirin. Eger jin li hemberî vê yekê nerazîbûna xwe tînin ziman û daxwaza hebûna xwe bikin têne kuştin an jî di girtîgehan de dirizîn in. Dema mêr gunehê xwe bi jinê tîne û ji ber wê zeyîf dibîne di bin navê parastinê de zagonan jê re datîne, ev ne hevaltî ye, ev kuştin e. Eger jin bi xortan re derbikevin bigerin, bi wan re rûnin û argîlê vexwin ev ne pêşketin û guhertin e. Bê pîvan bi mêr re danûstandin xefke û mirov nikare bibêje ev pêşketin e.

Jina Kurd dema ku li hemberî cinsiyetparêziya civakî dest bi têkoşînê kir ne ji bo bibe dost û hevalê mêr. Pir bi êşe ez bibêjim, hêvîkirina hevaltiyê ji mêr xapandin e. Em çiqasî hewl bidin xwe bi mêr bidin qebûlkirin em ewqasî ji xwe dûr dikevin û di destê mêr de dibin amûr. Jinê neçar dikin ku aliyê ruhî û fîzîkî bikeve bin xizmeta mêr de û li beramberî wê layiqî jinê nabînin ku rêz bidin wê. Ji xwe ji mêr û civaka cinsiyetparêz hurmet hêvî kirin, şaştiye. Jina gihîştibe asta xwe birêxistin bike, têbikoşe wê her kes rêz bide wê.

Rêbazên xizmetkirina doza jin gelekî zirav in, şûna em bibêjin Hevalê min eger em bibêjin Hevala min, hêviyan ji mêr nekin dibe ku pirsgirêka jin were çareser kirin. Heyanî mêr xwe nede guhertin û nêzîkatiyên xwe ji jin re nede guhertin hêviya çareseriyê kirin, wê bê encam be.



# Li ser zimanê Kurdî hin rist û gotin...

**Zimanê Kurdî ji bo hemû qadên civaka Kurdî bi nivîskar, rewşenbîr, zimanzan, dîroknas û hwd ve stûneke serke ye. Lewma jî her kesayeteke ku xwedî hizrekî Kurdî ye gotin û ristên nirxdar li ser zimanê xwe anîne ziman.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Dîroka weşandina yekemîn jimara kovara Hawarê 15'ê Gulana 1932'yan wek Roja Zimanê Kurdî ji 2006' an vir de tê pîrozkirin. Beriya vê dîrokê jî nivîs, weşan û pirtûkên Kurdî hatine weşandin û çapkirin. Lê belê heta kovara Hawarê tu nivîs bi tîpên latînî nehatiye nivîsandin.

Tevahiya nivîskar, helbestvan, kesayetên xwedî bandor di nava civakê de bal kişandine ser girîngiya zimên ji bo civakê. Lewma jî hin navdarên Kurd ji serdemên cihêreng ziman nasandine û girîngiya bikaranîna wê ji bo miletê Kurd destnîşan kirine, ji wan, helbestvanê Kurd Melayê Cizîrî, Cegerxwîn, Celadet Bedirxan, Şêx Meişûqê Xeznewî û Konê Reş.

### Melayê Cizîrî zimanê Kurdî nirxdar dike

Melayê Cizîrî, xwe û zimanê xwe û welatê xwe, hem jî zimanên din û helbestvanên din û welatê wan daye ber hev û tu carî xwe û zimanê xwe û welatê ji wan kêmtir nedîtiye. Di beyta jêr de bibînin. Awa nasnameya hunerî û zimanî û mekaniya xwe li gel yên din dinirxîne û bêyî ku nijadperestiyê bike, nêrîna xwe wiha tîne ziman:

Ger Luiluiê Mensûr Ji Nezmê Tu Dixwazî
Wer Şî'ra Melê Bîn, Te Bi Şîrazî Çi Hacet

Di vir de Melayê Cizîrî li gel guhdarên




Kurd daxive, ew guhdarê Kurd ku ketiye dû ziman û nasnameyek din û jê re dibêje, eger tu li dû gewhera nivîskî û helbestan î, here helbestên Melayê Cizîrî bixwîne ku bi Kurdî hatine nivîsandin û pêwîstî bi yekê nake bikevî dû Şîrazî, ku mebesta wî helbestvanên Furisê mîna Hafizê Şîrazî û Seidî Şîrazî ye. Melayê Cizîrî şîretê li Kurdan dike û dibêje, Girîngiyê bi ziman û kultura xwe bidin. Eger gelên din bûne xwedan dewleta hunerî û diravê (sikke) xwe yê hunerî ku nîşana paşatî û serbxwebûnê ye, Melayê Cizîrî jî dengê xwe bilind kiriye û dibêje, Min jî wek nûnerekî zimanê Kurdî, diravê helbestê qezenc kiriye û ew dirav niha li cîhanê tê bikaranîn.

### Celadet Bedirxan bal dikişîne ser fêrbûna ziman

Mîr Celadet Bedirxan di Kovara Hawar de ji sala 1932'yan li Şamê derheqê zimanê Kurdî de wiha tîne ser ziman: "Heçî em Kurd, me zimanekî delal heye û em pê diaxivin, piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimên ji bo her miletekî, êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî ye, lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne, wezîfa xwe ya milî pêk neanîne û bi kêrî miletê xwe nehatine. Ji bona ku mirov bikare xwe ji miletekî bi hesibîne, divêt ku bi kêrî wî bê."

Li hêlekê Mîr Celadet Bedirxan fêrbûna ziman bi netewbûnê ve girêdide û dibêje: Kuro Eyb e, şerm e, fihêt e yan hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibin, an mebêje ez Kurd in."

### Cegerxwîn bi ristên helbestê zimanê Kurdî şêrîn dide nîşandan

Cegerxwîn jî mîna helbestvan û rewşenbîrên Kurdan ên din bi ristina helbestê şêrînbûna ziman û dewlemendiya zimanê Kurdî daye teysandin, ev yek jî di hin malkên jêrîn de tê xuyakirin.

Zimanê me xoş û xeroş û ciwan
Eger baş bizanî tu nakî ziyan
Binêre zimanê te çend dewlemend
Li bajêr, tu carek xwe bigihêne gund
Bibêhne çi şêrîne ev reng ziman

### Şêx Meişûqê Xeznewî zimanê Kurdî şêrîntir didtî ji zimanê Erebî

Tevî ku tiştekî baş e mirov fêrî zimanê çandê din bibe, lê fêrbûn û axaftina bi zimanê dayîkê ya herî girîng e ji bo her mirovekî/ê. Şêxê Şehîdan, Meişûqê Xeznewî bi zimanê Kurdî û Erebî dizanî bû, lê di Newroza Qamişlo ya 2005'an de berî ku nameya xwe bigihîne gelê Kurd, derbarê zimanê Kurdî de wiha got: "Ez dixwazim du xebera bêjim bi Kurmanciya xwe ya şikestî… ez bi guman im wê ev Kurmanciya min a şikestî wê nêzî dilê we be bêhtir ji Erebiya min î xweş. Eger şikestinek di Kurmanciya min de hebe, ne suncê min e, eger dibistanên me hebane, me fêrî ziman, xwendin, çand û kelepora me kiribaya, wê bi 10'ê caran Kurmanciya me ji wiha baştir ba."

### Konê Reş jî zimanê Kurdî weke tacekê dibîne

Nivîskarê Kurd Konê Reş li ser dîrok û danasîna zimanê Kurdî wiha dibêje: "Wek ku diyar e her miletek di cîhanê de, hebûna xwe bi zimanê xwe dide naskirin; li Erebistanê zimanê Erebî nîşana hebûna miletê Ereb e, li Tirkistanê zimanê Tirkî nişana hebûna miletê Tirk e, wiha jî li Kurdistanê zimanê Kurdî nîşana hebûna miletê Kurd e. Zimanê me, ne kêmî zimanê xelkên derdora me ye. Kok û rehên zimanê me vedigere hezarê salan, rewa xwe ji ava çemê Dicle û Feratê standiye, bi Çiyayê Cûdî, Zagros, Toros û Agirî re mezin bûye. Bi Keleka Nûh Pêxember re gerya ye û dawî ji Cizîra Botan, Cizîra Mîr Şeref di dinayê de belav bûye. Îro, zimanê me taca serê me ye.!"

# Desteya çandê navenda pêşxistina jêhatiya ye

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Rêvebera Ofîsa Jin ya Desteya çandê ya xweser ya Kantona Cizîrê Seher Mehmûd anî ziman ku asta çandê di salên dawiyê de pêşketinek ber bi çavan tê de çêbûye û wiha got: "Di desteya çandê de gelek kar û xebat têne meşandin û bi tayber li ser jêhatiyên ciwanan tê seknandin û piştgiriya wan tê kirin."**

Desteya çandê ya Kantona Cizîrê ku bi avakirina Rêveberiya Xwser di 2004'an de hat avakirin. Armanca avakirina wê ji birêxistinkirina kar û xebatên çandê li herêmê, ji aliyê komkirina Rewşenbîr û Hunermendan ve heta ku di nav desteyê û kar û xebatên wê debin.

Derbarê kar û xebatên Desteya çandê ya xweser a Kantona Cizîrê Rêvebera Ofîsa Jin ya Desteya çandê Seher Mehmûd ji Rojnameya me re axivî.

### Kar û xebatên Desteya çandê dane meşandin

Rêvebera Ofîsa Jin ya Desteya çandê Seher Mehmûd anî ziman ku Desteya Çandê gelek kar û xabat di van salan de meşandine û got: "Karên ku Desteya Çandê dane meşandin, gelek festîval hatin lidarxistin ku her sal ev Festîval tên lidarxistin weke Festîvala Jin a ku ji deh salan de heye, Festîvala Osman Sebrî ya wêjeyî, Festîvala Biratiya Gelan û Festîvala govendê, herwiha çend Pêşangehên Wênesaziyê, ev pêşangeh li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne, di heman demê de her sal pirtûk tên çapkirin, pirtûkên ku di festîvalan de serketî bûn û yên Nivîskaran tên çapkirin. Saziyên ku di Desteya Çandê de cihê xwe digrin ev in: Makînevana Lîlît bi taybet ya jinê ye, Orkêstira Rojava ya Zarokan, Rêveberiya Geştiyariyê ya ku karûbarên xwaringeh û otêlan dişopîne û destûran dide wan û Rêveberiya Antîkan e. Di Desteya Çandê de 15 navend li seranserî erdnîgariya Kantona Cizîrê hene, ev navend tê de kursê muzîk û stranan û yên govendên filiklorî têne dayîn, herwiha kom tê de hene ji pêkhateyên Kurd, Ereb, Suriyan, Ermenî pêk tên, herwiha dibistana Şanoyê heye ku zarokên ku jêhatiyên wan hene wan dihewînin, Navenda Pargîn li ser belgekirinê zêdetir ji perwerdeyê disekine. Em di hundirê Desteya çandê de destek didin hev û bi hev re alîkarin.

### 'Kar û xebatên ku di sala 2025'an de nehatine pêkanîn'

Seher Mehmûd eşkere kir ku ji ber rewşa welêt gelek kar û xebatên 2025'an de hatin derengxistin û wiha got: Ji bo rewşa Seda Tişrînê û şehîdan gelek kar û xebatên me hatin derengxistin, Festîvala Jin wê weke her sal di 21'ê Adarê de hatiba lidarxistin, lê ji ber rewşên cuda dîroka lidarxistina wê derbasî 17'ê Nîsanê bû, herwiha cejna Ekîto ku di 1'ê Nîsanê hat lidarxistin û Festîvala Biratiya Gelan di demên pêş de wê bê lidarxistin. Herwiha di vê sale de pêşangehên Wênesaziyê hatin lidarxistin. Astengiyên ku bi me re derbas dibin ji aliyê hişmendiyê de ye û çiqasî di asta çandê de me pêşketin pêkanîne û me heyanî çi astê bandora me li ser civakê pêkhatiye.

Desteya çandê pêşketinek wê ya berbiçav di sale dawiyê de çêbû, lê hê jî em negihiştine asta pêwîst, ji ber wê jî hişyarî bi riya navendên çandî li ser tê kar kirin, herwiha astengiyên din jî hene ji ber rewşa em tê de jiyan dikin û zehmetiyên jiyanê."

Rêvebera Ofîsa Jin ya Desteya çandê Seher Mehmûd axaftina xwe wiha qedand û got:"Asta Desteya çandê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji salên



derbasbûyî de pêşketineke ber bi çav pê re çêbûye. Me bi riya pêşbirkan û belavkirina xelatan pêşketinên ku di asta çandê de çêbûye dît ku çawa di van salan de pêşketinên mezin di asta çandê de çêbûne û çawa asta çndê berfirehtr bûye, herwiha hêsankirina ji aliyê Rêveberiya Xweser jî heye ku mirovên jêhatiyên wan hene piştgiriya wan dikin. Di sê salên dawî de fokus li ser pirojeyên biçûk tê kirin, weke karên destan yên sade ên li gundan û li ser pirojeyên ji bo jinan tê kar kirin weke dirûtinê bi sûfê û karên destan, herwiha ji bo tomarkirina stranan bê biha ji bo hunermendan tê kar kirin. Asta çandê bêhtir di van salên dawiyê de pêşketin çêbûye. Em başbûnê dibînin ji nirxandinên ku di Festîval û pirtûkên ku tên çapkirin de."

**Têbînî**



## Cejna Zimanê Kurdî..Ne Rojeke, Hemû Rojên Salê

Kemal Necim

Roja 15`ê Gulanê roja zimanê Kurdî ye. Ev roj bi boneya roja weşandina hijmara yekem ya kovara Hawarê ku di 15'ê gulana 1932`an de li paytexta Sûriyeyê Şamê ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve yekem car hate weşandin, weke roja zimanê Kurdî hatiye destnîşankirin.

Li gelek deverên kurdistanê her sal bi vê boneyê çalakî û pîrozbahî têne lidarxistin. Îsal jî bi taybet li Rojvayê Kurdistanê ji niha de pîrozbahiyên roja zimanê Kurdî des pê kirin.

Bê guman bibîrxitina vê rojê xebateke girîng e ji bo danasîn û pêşxistina zimanê Kurdî weke nirxek û hêmaneke hebûna neteweyî ya kurdan. Lê carna pirsek tê bîra mirov, ka gelo bibîrxistina zimanê Kurdî tenê di rojekê salê de têra parastin û geşepêdan û pêşxistina ziman dike?

Li Rojavayê kurdistanê piştî pêvajoya şoreşa 19`ê Tîrmehê û despêkirina proseya perwerdeya bi zimanê kurdî li dibistan û zanîngehan di warê pêşxistina zimanê kurdî de gavên dîrokî hatine avêtin û mirov dikare bêje ku di 10 salan de, pêngavên bi qasî 100 salan hatin avêtin. Lê dîse jî hîna di vê der barê hin arîşe û pirsgirêk û reftarên neyênî hene ku zimanê kurdî ber bi paş ve dikşînin û rêya pêşketina ziman asê û dijwar dikin.

Tevî ku di Peymana Civakî ya Rêveberiya Xweser de zimanê kurdî li kêleka zimanên Erebî û Suryanî weke zimanên sereke yên Sûriyeyê hatine pênasekirin jî. Lê heta niha piraniya saziyên rêveberiyê di belge, peyam, kaxet, têkiliyên fermî û kargêriyê de zimanê Kurdî bi rêkûpêk bi kar nayinin, eger carna bikar tînin jî bi gelek şaşî û kêmasiyan bi kar tînin.

Di civakê de jî, ji bilî danûstandinên rojane – ku ew jî tije şaşî û peyvên biyanî ne- zimanê kurdî nebûye zimanê yekane yê têkiliyên fermî û nivîskî. Piraniya xwendekar, rewşenbîr û nivîskarên Kurd post û şîroveyên xwe yên li ser medyaya civakî jî bi zimanê Erebî dinivîsin

Tişta herî bi êş jî ew e ku sazî û dezgehên çandî, hunerî û rewşenbîrî jî di belge, vexwendin, çalakî û nivîsên xwe yên din de zimanê kurdî têr bi kar nayinin. Heme bêje hemû vexwendinên çalakiyên çandî û hunerî bi zimanê Erebî yan jî bi kurdiyeke ne durist têne nivîsîn. Her wiha bi bandora têgehên biratiya gelan û jiyana hevbeş, pir caran çalakiyên rewşenbîrî yên kurdan bi zimanê Erebî têne lidarxistin.

Pir diyar e ku êdî dem hatiye ji bo zimanê kurdî bibe zimanê yekane di kargêriya rojane û xebat û reftarên dezgeh û saziyan de.

Divê saziyên rêveberiyê yên li herêmên Kurdan hemû belge û nivîs û peyamên xwe bi zimanê Kurdî binivîsin. Ji bo wê jî divê kesên di ziman de pispor erkdar bikin.

Sazî û dezgehên rewşenbîran divê guh bidin çalakiyên xuerû bi kurdî, li gorî wê jî hemû vexwendin, nivîs, poster û belgeyên çalakiyan bi kurdî bin.

Divê nivîskar, rewşenbîr û xwendekarên Kurd li ser medyaya civakî bi awayekî rêkûpêk zimanê Kurdî bi kr bînin.

Ango divê têkiliya bi zimanê dayikê, zimanê kurdî re bibe reftareke rojane, ne tenê salê rojekê bibe boneya şahî û pîrozbahiyê.

# Dorpêçkirina Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî plana dewleta Tirk a dagirker e

Endama Komîteya Perwerdê ya Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) Leyla Îlhan diyar kir ku dema em temaşeyî rewşa Îraqê dikin bê guman em nikarin ji rewşa Rojhilata Navîn ya heyî qut bigrin dest û wiha got: "Têkiliya di navbere Îraq û Tirkiyê de yê ku du dewletên dagirker in, li ser Kurdistanê heman polîtîkaya dagirkeriyê didin meşandin."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Armanca hikumeta Îraqê ji dorpêçkirina Mexmûrê pêkanîna siyaset û planên qirêj yên dewleta Tirk a dagirker e. Rengê jiyana gelê Mexmûrê xweser û azad e, gel hemû awayên bindestiyê red dikin. Lê niha dewleta Tirk a dagirker planeke qirêj daye pêşiya hikumeta Îraqê, ew dixwaze wargehê ji gel re bike zindan û vîna gel bişkîne. Planên wisa qirêj ji taybetmendiyên siyaseta dagirkeriya Tirk e, lewra ji bo dorpêçkirina Mexmûrê û pêkanîna armancên xwe, hikumeta Îraqê kir weke alavekê û bi kar anî, armanca ji vê yekê jî ku dewleta Tirk a dagirker wargehê û herêmê bi giştî dagir bike.
Derbarê dorpêçkirina Mexmûrê Endama komîteya perwerdê ya wargeha şehîd Rustem Cûdî Leyla Îlhan ji rojnameya me ye axivî.



**'Dorpêçkirina wargeha Mexmûrê plana dewleta Tirk a dagirker e'**

Leyla Îlhan destnîşan kir ku plana hikumeta Îraqê ji yê Tirkiyê ne dûr in û wiha got: "Rewşa ku niha li Îraqê tê jiyan kirin ji ya Rojhilata Navîn ne cuda ye, di heman demê de têkiliya di navbera Îraq û Tirkiyê de, ku her du hêz weke du dewletên dagirker li ser kurdistanê, dema ku mijar dibe Kurd û destkeftiyên Kurdan heman polîtîkiyê didin meşandin. Ji bo wê jî banga Rêber Apo ya ji bo aştî û civaka demokratîk li Kurdistanê û li tevahî cîhanê bandorek mezin kir û ew bang çareseriya hemû pirsgirêkan e, li hember wê jî dewleta Tirk bê navber hewil dide ku banga Rêber Apo vale derxîne, polîtîka xwe ya qirkirinê li ser Kurdan bidomîne û her ku dewleta Tirk polîtîka qirkirinê dide meşandin wargeha me jî zirarê zêdetir dibîne, ji ber ku wargeh parçeyek ji têkoşîna 50'î sal ya tevgera azadiyê û têkoşînek 30' sal di şert û mercê penaberiyê de dide meşandin. Di van demên dawî de di navbera Îraq û Tirkiyê de civîn, hevdîtin û li ser peymana enerjîyê ya ku bi hev du re sazkirine herdem xeteriyek li ser wargehê daye çêkirin û dewleta Tirk weke şertekê daye pêşiya Îraqê ku çiqas wargehê bike bin zext û fişarê wê dewleta Tirk razî bike ev bi salane ku polîtîkek bi vî rengî tê meşandin. Gelek caran rayedarên Îraqê bixwe dibêjin ku em neçarin ku bikin ji ber ku dewleta Tirk zextê li me dide wê demê em neçar dibin ku zextê li ser we bikin. "




**'Gelê wargehê bi vîneke mezin têdikoşin'**

Leyle diyar kir ku berî 2 salan carek din dewleta Îraqê êrîşî wargehê kir û derdora wargehê bi gîştî têl kir û wiha domand: "Berxwadana gelê wargehê û piştgiriya ku ji derve ji bo gelê wargehê hatî dewleta Îraqê ji vê biryara xwe ya bê zagonî paş de gav da avêtin, di wê demê de rayedarên Îraqê bi eşkereyî gotin ku dewleta Tirk ji bo ku em êrîşî we bikin gefan li me dixwe. Ava Dicle li ser me qut kirin, dewleta Tirk hemû polîtîkan dide meşandin ji bo îradeya ku li wargehê hatiye avakirin ş sekna ku ev 30 sal di şert û mecên penaberiyê de bi têkoşîn û berxwedanî lawaz bike û wargehê têk bibe, ji ber wargeh şahidê zindî yê kiryarên dewleta Tirk ku di salên 80'î û 90'î de li Bakurê Kurdistanê daye meşandin ku di encama van kiryarên dewleta Tirk de 4 hezar gund zêdetir hatin vala kirin û li gorî daneyên fermî 17' hezar kesên ku berpirsê wan dewleta Tirk e, hatin qetilkirin û hin ji wan heya niha jî winda ne. Wargeh xwedî misyoneke zagonî ya navneteweyî ku ji aliyê neteweyên yekbûyî ve weke penaberên siyasî hatiye qebûlkirin û li gorî vê sitatoya penaberên siyasî xwedî mafê hesab xwestinê ji dewleta Tirk e. Her tim wargeh di bin êrîşa dewleta Tirk deye, sekna gelê wargehê sekna têkoşîn û rûmetê ye. Gelê wargehê di pêvajoya 30 salî de eger çi bi destxistibe bi têkoşîn û berxwedana xwe bi destxistiye. Li gorî pêşeroja heyî di her alî de wê çalakiyên şênber, hişyarkirina raya gîştî, têkiliyên peywendî yên bi dewleta Îraqî re em hewil didin ku van pirsgirêkên ku li ser civakê têne meşandin çareser bikin."

**'Banga xwedî liderketina welatiyên wargehê dikin'**

Endama komîteya perwerdê ya wargeha şehîd Rustem Cûdî Leyla Îlhan di dawiya axftina xwe de bang li netewên yekbûyî kir û wiha got: "Banga me ji hemû kesên ku têkoşîna azadiyê li cîhanê didine meşandin ew e, ku polîtîka qirkirinê ku ji aliyê Îraq û Tirkiyê ve li ser gelê Mexmûrê tê meşandin bisekinînin û em bang dikin têkoşîna ku gelê wargehê dide meşandin di raya gîştî de bê zanîn û neteweyên yekbûyî xwedî li gel derkeve û berpisyariya xwe pêkbîne. Ji ber ku wargeh di milê ewlekarî, pêwîstiyên jiyana rojane, perwerde û tendirostî di bin berpirsyariya N.Y de ye. Lê N.Y çavê xwe ji kiryarên dijmirovî yên dewleta Tirkiyê û Iraqê digre û dengê xwe jêre nake.

# Edîp Karahan; Nivîskar û şoreşgerê Kurd

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Îro di ser wefata nivîskarê Kurd û damezirînerê Rojnameya Dicle-Firatê ku dewleta Tirk ji pênûsa wî ditirsiya, Edîp Karahan 51 sal derbas dibe. Edîb Karahan mînaka nivîskarê şoreşger bû ku tevî hemû astengiyan li ber xwe da.**


Di dîrokê de gelek nivîskarên Kurd ên bi nav û deng hene ku hewil dane dîrok û çanda kurdan neyê windakirin, yek ji wan jî nivîskarên ku bi nivîsên xwe nasnameya kurdan parastiye Nivîskar Edîp Karahan e.

**Kurtejiyana nivîskar Edîp Karahan**

Nivîskarê Kurd Edîp Karahan di sala 1930'î de li Dêrika Çiyayê Mazî hatiye dinyayê. Wî heta bi lîseyê, li welat xwendiye û berî ku qeyda xwe li Fakulteya hiqûqê ya Stenbolê de çê bike, bi qasî salekê li Fakulteya Edebiyatê, beşê Felsefeyê xwendiye.
Edîp Karahan gelek caran ji ber nivîsên xwe hatiye girtin
Ew gelek caran ji ber fikrên xwe yên siyasî tê girtin û di hepsan de dimîne. Di sala 1953"an de li Stenbolê bi hinceta ku ew komunîst e hate girtin û hate beraetkirin, ji ber ew yek ji wan kesan bû ku zû li kurdayetiya xwe hay bûye û bi meseleyên fikrî ve rabûye. Paşê ji ber gotarên xwe yên di kovara Forumê de hatine weşandin, 6 meh di girtîgehê de ma. Çend salan li Fakulteya Hiqûqê ya Stenbolê xwend, lê girtin û astengiyên din rê li ber qedandina xwendina wî girtin. Ew bû sernivîskarê rojnameya Dicle Firatê, ku hejmara wê ya yekem di 1'ê Mijdara 1962"an de hate weşandin. Di vê rojnameyê de ji bilî navê xwe yê rast Edîp Karahan van îmzeyan bi kar tîne: Edîp Osmanoglû, Hamît Mazîdaglî, Mahmut Bayraktar, Reşo Dîcle. Ji ber nivîsên xwe yên di Firatê de 2 sal cezayê girtîgehê lê tê birîn. Ew vê cezayê xwe bi salekê li zindanên Enqere û Stenbolê diqedîne. Ew di 6'ê Hezîrana 1963"an de, di çarçoveya doza "salên bîstan" de hate girtin. Wî di 3'ê Îlona 1967"an de di mîtînga Diyarbekirê de gotarek pêşkêş kir û paşê ji ber gotareke ku kir nêzîkî salek cezayê girtîgehê lê hat birîn û 9 mehan di girtîgehê de ma.

**Di 15'ê Gulana 1976"an de li Stenbolê koça dawî kir**

Di Hezîrana 1970"î de belavokek bi sernavê "Şerê Rizgariya Neteweyî ya Kurd li Iraqê û fermandarê wê yê giştî, General Barzanî" çap kir û belav kir. Ew di sala 1971"an de salek û nîv li girtîgeha ragirtinê ya rewşa leşkerî ma û di doza DDKO'yê de ku tê de hatibû darizandin, 6 sal cezayê girtîgehê lê hat birîn. Di heman salê de, ew li Tirkiyeyê jî di doza Partiya Demokrat a Kurdistanê de hate darizandin. Di 8'ê Sibata 1971"an de li mîtînga Kozlukê gotarek pêşkêş



kir û di 11'ê Nîsana 1971"an de li DDKO'ya Diyarbekirê semînerek li ser mijarên neteweyî da û ji ber vê semînerê hat cezakirin. Ew di 15'ê Gulana 1976"an de li Stenbolê koça dawî kir.



# Dîroka qirkirina gelê Kurd Serhildana Agirî û Geliyê Zîlan (1)

Serhildanên Agiriyê navê çend serhildanên rêxistin û eşîrên Kurdan e ku di salên 1926'an -1930'î de li derdora Çiyayê Agiriyê û li Rojhilatê Kurdistanê pêk hatiye. Ev bûyer di dema 1929'an de tevlîhev bûn û pereyê ku serhildanê bi dawî bike hate xerckirin û mezaxtin, lewra bû sedema aloziyê li Komara Tirkiyê.

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Bi belgeyê de bal tê kişandin ku şerê bi qasî 3 mehan dirêj kiriye û Înglîzan di wê demê de zanîn ka balafirên wan xwe li ber digirin an na. Derbarê balafirên di êrişê de hatine bikaranîn û serhildanê de ev agahî tên dayîn: "Di sedsala dawîn de gelek komên olî û netewperest ji bo azadî û serxwebûna welatê xwe gelek tekoşiyan. Demek dirêj, ji ber vê sedemê di navbera Kurdan û Dewleta Tirk û rejîma Iraqê de lihevnekirinek hebû. Di salên 1920-1930'î de li Tirkiyeyê gelek serhildanên Kurdan rabûn. Kurdan bi piştgiriya Xoybûnê bi rêbertiya General Îhsan Nûrî Paşa di sala 1927'ê de dest bi mezintirîn serhildana Kurdan kirin. Serxwebûna Komara Kurd a Agiriyê îlan kir. Ji ber wê artêşa Tirk di 11'ê Pûşpera sala 1930'î de bi 66 hezar leşker û 100 balafiran êrişê serhildanê kir. Hikûmeta Kurd ji Înglîstan û civatên navnetewî daxwaza alîkariyê kir. Şer 3 mehan dom kir. Serhildan di 17'ê Îlona 1930'î de hat çewisandin. Hêzên esmanî yên Tirk piştgirî dida êrişên leşkerî yên bejahî. Ji ber vê jî gelek balafirên Letov S.16 hatin daxwazkirinn. Piraniya van balafirên ku pir zû hatin sazûmankirin, ji aliyê Kurdan ve hatin xistin. Lêkolîner Ayşe Hur jî derbarê balafirên di çewistandina serhildanê de hatin bikaranîn de van agahiyan dide: "Li gor belgeyek a Înglîzan a 27'ê Nîsana sala 1925'an, di fîloya balafiran a li Mêrdînê de tenê 2 balafir dikarîn bixebitin. Li gel 4 balafirêfn Frasiyan piştî vekişînê bi cih hêlayîn, tenê 4 balafir li Mêrdîn hebûn. Sotemeniya van balafiran jî bi şemendeferan ji Stenbolê dianîn. Ev balafir tenê dikariyan rojê du caran bifirin. Diçûn serhildanê bombebaran dikirin û vedigeriyan. Ji ber sabotajan dîsa vedigeriyan Mêdînê. Di 5'ê Pûşpera sala 1925'an de Tirkiye û Împeratoriya Brîtanya bi hev re peymanek mor dikin. Li gor peymanê, serbazê Înglîz ê li Stenbolê R. E. Harene û Yarbayê Deryayî yê Îtalî Neyroni bi armanca bibandorkirina Hêzên Hewayî yên Tirk raporek amade kiribûn. Li gor vê raporê heta dawiya sala 1926'an, 153 balafirên şer ên Hêzên Hewayî yên Tirk hebûn.77'ê ji wan (bi markayên 20 Bréguet, 10 Junkers, 30 Caudron, 17 Savois) û di sala 1925'an de hatibûn kirîn. Herwiha 10 balafirên şer ên ji Osmaniyan jî mabûn hebûn. Balafirên Hêzên Esmanî yên Tirk di sala 1927'an de cara yekemîn li hemberî hêzên birayê Şêx Seîd, Şêx Ebdulrehman hatin bikaranîn. Li gor raporek sîxûrî ya Fransiyan, balafir ji Palo û Meletî radibûn, di 25'ê Cotmehê de 5 balafirên anîbûn Mêrdînê li hemberî serhildêrên Kurd hatin bikaranîn. Bi giştî 24 balafir li herêmê ji bo êrişê amade bûn. Hêzên Hewayî yên Tirk di navbera salên 1927-1930'î de gelek caran balafirên xwe yên şer li hemberî Serhildana Agiriyê bi kar anîn. Dîsa li gor rapora sîxûriya Franseyê ya bi dîroka 27 Çile 1928'an, di destê Hêzên Hewayî yên Tirk de 200 balafirên şer hebûn. (Mînak di sala 1928'an de 45 lib Bréguet 197 A2 hatibûn kirîn). Li gor Robert Olson jimara balafiran di sala 1930'î de bû 360 ji vana di Serhildana Agiriyê de hatin bikaranîn. Lê li gor lêkolîner Emîn Karaca di serhildana Agiriyê de nêzî 80 balafir hatin bikaranîn."

**Serhildana Agirî û Ihsan Nurî Paşa**

Ihsan Nûrî Paşa, generalê artêşa Xoybûnê û pêşengê Serhildana Agiriyê, weke îro beriya bi 45 salan li sirgûna Tehranê di encama qezayekê de wefat kir. Em ê berê xwe bidin serdema beriya Serhildana Agiriyê û dema Serhildana Agiriyê da ku wî bi bîr bînin. Di dîroka Kurdan de gelek raperîn û serhildan çêbûne. Yek ji wanên herî zêde bi rêk û pêk, Serhildana Agirî ye. Di




dawiya vê serhildanê de gelek kesan jiyana xwe ji dest daye, hatine girtin û mişextkirin, lê belê nav û dengê vê serhildanê qet nehatiye jibîrkirin û hîna jî qala serhildanê tê kirin. Lewma, cihê vê serhildanê di dîroka Kurdan de xwedî ciyekî taybet e. Di destpêka sedsala 20'an de qeyranê girtibû dinyayê. Împaretoriya Osmanî jî di nav vê qeyranê de digevizî û roj bi roj hêza wê kêm dibû. Netewe hemû li dû azadî û serbixwebûna welatê xwe bûn. Neteweyên di bin banê dewleta Osmanî de jî yek bi yek jê vediqetiyan. Ji ber van sedeman, Şerê Cîhanê ê Yekemîn dest pê kiribû û li her aliyê cîhanê qeyranên siyasî û aborî li dar bûn. Piştî Bedirxanîyan û Serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî, Kurd demekê bêdeng bûn û ji hev hatibûn belavkirin. Bi avakirina Komara Tirkiyê ya nû re înkar û tinekirina Kurdan jî dest pê kiribû. Hebûn û navê Kurdan hate qedexekirin, çand û ziman kete ber aşê helandinê. Welatê wan hate dabeşkirin. Ne tenê Kurd, di destpêka sedsala 20'an de Komara Tirkiyê xwest civakên li Tirkiyê hemûyan qir bike û tenê şoveniya Tirk bi pêş bixe. Rêxistinên weke Îttîhat û Teraqqî bi fikra yek al, yek dewlet û yek millet kadroyên damezrênerên komara Tirk jî bûn û cihêrengiya Tirkiyê ji holê rakirin. Ber bi salên 1920'an ve van qeyranên siyasî û aborî bandor li Kurdên li Stenbolê kir û wan jî dixwest ji bo welatê xwe şerê azadî û rizgariyê bikin. Ew ji nijadperestiya Tirk a ku her roj gef li wan dixwarin û neteweya wan tine dihesiband, aciz bûn û wan dixwest ji wan xelas bibin û serbixwe bin. Hingê gelek rêxistin hatin damezirandin. Kovar û rojname derketin. Xebatên siyasî û çandî bi pêş ketin. Di nav wan de ya herî navdar "Rêxistina Azadî" bû. Rêxistina Azadî bi pêşengiya xwendevan û rewşenbîrên Kurd ên wê demê xwest ku li Bakûrê Kurdistanê serhildanekê pêk bîne lê mixabin bi ser neket û di dawiyê de bi sedan kes hatin kuştin, hin kes hatin girtin û hin kes jî neçar man ku birevin derveyî welat. Şêx Seîdê Kal û hevalên xwe li Amedê bi awayekî hovane hatibûn bidarvekirin. Piştî vê şikestinê, Kurd qederekê dîsa bêdeng man. Lê kesên ku ji ber şûrên Osmaniyan filitîn, li binxetê (Rojavayê Kurdistanê) careke din li hev civiyan û rêxistina Xoybûnê ava kirin. Rêxistinê dixwest dest bi şerekî nû bike. Piştî dahûrandina encamên şikestina serhildanên berê, Xoybûnê bingeha Serhildana Agirî danî û biryar da ku li Agirî deng û ala Kurdistanê hilbe. Serhildana Agirî serê pêşî, Îhsan Nûrî Paşa tîne bîra mirovan. Îhsan Nûrî Paşa, yek ji wan leheng û pêşengên Serhildana Agirî ye. Bi gotineke din ew generalê artêşa Xoybûnê bû û ji milê leşkerî berpirsyar bû.

**Destpêk Mektebên Eşîran bû**

Îhsan Nûrî Paşa sala 1893'an li Bedlîsê ji dayîk dibe. Kurê Eliyê Qulî yê ji eşîra Cîbran e. Malbata wî, wek "Mala Qulî" jî tê naskirin. Piştî dibistana seretayî ew diçe "Mektebên Eşîran" ku tenê zarokên eşîrên mezin dikarîn biçinê. Ev mekteb ji hêla Evdilhemîdê Dûyem ve hatibûn avakirin û armanc ew bû ku zarokên Arnawûd, Ereb û Kurd li van dibistanan werin asîmîlekirin û bi dewleta Osmanî ve werin girêdan. Li gorî Împaretoriya Osmanî heger Kurd nehatana bişaftin, ew ê her tim li serê wan bela bin. Li gorî vê plansaziyê, dewletê dixwest zarokên eşîran bike karmendên xwe û bi xwe ve girê bide, da ku ew eşîr li ber wan serî ranekin. Dîsa bi heman armancê Alayên Hamîdiye hatibûn damezirandin da ku cerdevanî bi pêş bikeve û Kurd nikaribin xwe zû bi zû bi rêxistin bikin. Îhsan Nûrî Paşa bi salan li van mekteban dixwîne û herî dawî sala 1910'an wek serbazekî serketî yê ciwan di artêşa Osmanî de ciyê xwe digire.

# ‘Azadiya Rêber Apo azadiya me ye’

Jinên bajarê Qamişlo diyar kirin ku Rêber Apo jin ji koletiyê rizgar kirin, herwiha jina Kurd vîna xwe ji fikir û felsefeya Rêber Apo girtiye û wiha gotin: “Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêwîst e ku em xebatên xwe berferhtir bikin, ji ber ku azadiya Rêber Apo azadiya me ye.”

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Weke tê zanîn Rêber Apo di 27`ê Sibatê de bangeke dîrokî ji bo aştî, çareseriya doza gelê kurd û tevahiya gelên herêmê kir. Herwiha ruxmî hemû hevdîtinên ku têne kirin, lê heta roja îro mafê hêviyê pêk nehatiye .Dewleta Tirk a dagirker ji aliyê xwe ve tu gav neavêtin û êrişên wê berdewamin. Di derbarê vê mijarê de jinên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.



Wetha Xanîka



Eqlîma Hisên

### ‘Em ê her roj çalakiyan li dar bixin’

Jina bi navê Wetha Xanîka da zanîn ku ew ê her roj çalakiyan li dar bixin heta ku Rêber Apo fîzîkî azad bibe û wiha got: “Ruxmî hemû hevdîninên ku tên kirin, lê heta roja îro mafê hêviyê pêk nehatiye, ji aliyê deweleta Tirk a dagirker ve tu gav nehatine avêtin. Li hemberî wê dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe yên li ser Rojavayê Kurdistan berdewam dike .Ev yeke diyar dike ku dewleta Tirk a dagirker naxwaze ku aramî li herêmê pêk were, deweleta Tirk a dagirker dixwaze ku aşitî û destkeftiyên herêmê têk bibe. Cîhan bi tevahî dewleta Tirk dibîne ku van êrişên xwe pêk tîne û li hemberî vê yekê bê deng e. Em weke jin pêwîst e ku em rojan e li meşan û çalakiyan bin ji bo em Rêber Apo fîzîkî azad bikin. Ji ber ku bi saya Fikir û felsefeya Rêber Apo jin gihaye asta roja îro ku li tevhiya qadan de cihê xwe girtî ye û pêşengtiya civaka xwe dike.”

### ‘Em ê heta dawiyê li ser şopa Rêber Apo bin’

Wetha Xanîka eşker kir ku Rêber Apo ew ji koletiyê rizgar kirin û wiha berdewam kir: “Weke tê zanîn ku jina Kurd vîna xwe ji fikir û felsefeya Rêber Apo girtiye. Rêber Apo piştgirî da doza jin û ji koletiyê hate rizgar kirin, Rêber Apo rê li pêşiya me vekir ku em mafên xwe bidest bixin. Herwiha em şargirtên Rêber Apo ne, ji erka me ya bingehîn e ku berxwedaniyê ji bo azadiya fîzîka Rêber Apo bidin meşandin. Herwiha heta misogerkirina azadiya wî ya fîzîkî, em ê heta dawiyê li ser şopa Rêber Apo bin.”

### ‘Ji bo azadiya fîzîk a Rêber Apo pêwîst e ku em xebatên xwe berferh bikin’

Jina bi navê Eqlîma Hisên da anî ziman ku ew ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan çalakiyên xwe didomînin û wiha got: “Civaka navneteweyî û rêxistinên mirovî binpêkirinên li dijî Rêberê gelê Kurd Rêber Apo paşguh dikin. Êdî ji van siyasetên çewsînê re bes e, pêwîst eRêber Apo demildest bê berdan. Xebatên me ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo têne kirin têrê nakin û ne di asta ku tê xwestin de ye. Xebatên me ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hîna kêm in, ji me tê xwestin ku em xebatên xwe berferhtir bikin, ji ber ku azadiya Rêber Apo azadiya me ye.”

### ‘Pêwîst e em asta têkoşînê bilind bikin’

Eqlîma Hisên axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo nêrîna civakê derbarê jinan de hatin guhertin. Lewma jin îro dikarin birayara xwe bi vîna xwe bidin û rola xwe ya avakirina civakan pêk bînin e. Ji ber vê yekê pêwîst e ku em asta têkoşînê bilind bikin, ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan. Herwiha em ê heta ji bo pêkanîna azadiya fîzîk ya Rêber Apo têkoşînê bikin.”

# Lêgerîna çareseriyê û kongra PKK’ê

**Remezan Olçen**



Partiya Karkerên Kurdistanê kongra xwe ya 12’an pêk anî. Hem jî di demekî wisa de pêk anî ku Rojhilata Navîn, Kurdistan di duryanekê re derbas dibe. Çarenûs, hevsengî, qayişkêşî diguherin û yên nû çêdibin. Salên 1970’yî çawa ku herêm bi civak û siyasetê diguherî, li cîhanê şerên rizgariya netewî li dar bû niha di roja îro de jî li aliyekî şer li aliyê din jî her alî dixwaze xwe li ser ya din ferz bike.

Bi pêşengiya Rêber Apo, PKK û gelê Kurd di dewrekî wiha de dest li rêveçûna xerab a dîrokî dest werdidin. Dixwazin bêyî şer, bêyî pevçûn û xirecir aştî tanzîm bibe, bi rêxistinkirina civaka demokratîk hemû civak, bîr û bawerî wê bigihîjin maf û heqê xwe. Dema ev tê gotin hin derdor radibin, îdia dikin ku Rêber Apo, Tevgera Azadiya Kurd ji hemû talebên Kurdan qeriyane. Ez nizanim ev ji fêmnekirina pêvajoyê ye yan ji xêrnexwaziyê ye. Heke ji fêmnekirinê be mirov dikare bi hev re rune û hev îqna bike. Lê heke ji xêrnexwaziyû ye, navê vê yekê tiştekî din e. Ez wê jî ji wijdanê civakê re, dihêlim.

Çareseriya pirsa Kurd li hemû beşên Kurdistanê pêvajoyeke dûr û dirêj dixwaze. Ji îro heta sibê wê ew siyaseta înkar û qirkirinê weke bi devê kêrê bê jêkirin; wê neguhere. Di pêvajoya dem dirêj de wê ew jî pêk bê, lê niha ji îro heta sibê tiştên bên kirin hene ku Rêber Apo ji aliyê xwe ve, Tevgera Azadiyê û em Kurd ji aliyê xwe ve em ê bikin. Hiqûqa cîrantiyê em ê ji nû ve rêxistin bikin. Heke gotin li cî be em ê bi hev re kedî bibin. Ji xeynî vê rêyeke din tine.

Li aliyê din ji ber civakbûnê bi xurtkirina yekrêziya mala Kurdî, em ê daxwaza serxwebûna xwe bikin. Daxwaza ziman û çanda xwe bikin. Lê em ê vê ji dewletê nekin. Em ê ji xwe vê yekê bikin. Xwe xurt bikin, paşeroja xwe weke Kurd înşa bikin. BI ziman, çand û nasnameya xwe dîroka reşzivirî biguherînin. Ji bo vê PKK’ê pêşengî kir û dike. Vaye kongreya xwe jî pêk anî. Guherîn û veguherînê ji roja avabûyî heta îro çawa pêk anî wê ji îro pê ve jî pêk bîne.

Em berbayê heft û heştê kes û kûsan nekin. PKK’ê ne tenê hêzeke çekdar e. Ew bi xwe çeka herî xurt a Kurda ye. Ew rêxistin e. Ew dîrok e. Ew paşeroj e. Di cihekî weke Rojhilata Navîn de dêhna xwe bidinê, ti rêxistineke wisa emr dirêj tine. Hem jî di nava vê dojehê de tevî êrişên NATO’yê yên rasterast. Hemû rêxistin ji hev de ketin. Heta hewldan çêbûn ku PKK’ê jî wisa ji hev de bixin. Kurmê tasfiyekariyê xistin nav, lê taliya talî PKK’ê xwe mezin kir, xurt kir û heta van rojan. Bi sedan komele, sazî û dezgeh bi saya têkoşîna PKK’ê çi li beşên welat çi li derveyî welat xwe birêxistin kirin.

Rêxistingeriyeke weke ya PKK’ê wisa muazam û mezin li ti dera cîhanê tine. Îro ev rêxistin weke bername guherîn û veguherînê li ser esasên demokrasiya radîkal û hişmendiya neteweya demokratîk daniye pêşiya xwe û pêşiya me hemûyan. Ji lewra jî kongreya 12’an a PKK’ê ji niha ve mirov dikare bêje li dîroka têkoşîna azadiya Kurd û Kurdistanê rûpelekê digre û rûpelekê nû vedike. Ev ne dawî, despêkeke nû ye.

# “Şehîd hêza herî zindî ya jiyanê ne”

**Volqan Elî**

Erê... Em ên fanî dema me bihîst ku tu êdî ne li vê cîhanê yî me bertekek xav nîşan da: Em bask şikestî bûn. Wekî ku yek bikeve bîreke bê binî û tarî li me hat. Wekî ku di bihareke dîn û har de di şeveke ting û tarî de em li bahozekê qelibîbûn... Em ti car nefikirîbûn ku ew dilê te yê mezin, li hemberê dinyaya fanî têkbiçe... Lewra tu berdiliyê dost û dijminan bûyî... Ji ber wê yekê, wê ew dilê te yê mezin ji vî cengî bi selametî derketana. Lewra tu bûyî qasidê aştiya gur û berxan... Lê te bûna perperîka çaremîn hilbijart. Te xwe gihand heqîqeta agirê aştiyê. Sırrı Süreya Önder, şehîdê aştî û demokrasiyê...

Me xwest em bi serenivîs û çend gotinan hestên xwe ji bo ew mirovê mezin bînin ziman lê xuya ye li beramberê ruhekî wisa mezin, gotin û peyv zû bi zû cihê xwe nagirin.

Êşa me pir mezin e, lê em dilrehet in. Dema em dibêjin êşa me mezin e, ne bi gotinê ye. Êşa me wekî çiyayê Cudî mezin e, êşa me bi qasî çiyayê Agirî mezin e. Lê dîsa jî em wekî kêvroşkekê piştî zivistaneke qirûqiyamet derketiye ber biharê bi kelecana jiyanê ne, dilê me aram e.

Çima em bi vî şiklî li mijarê dinêrin? Ji ber ku em Kurd in, em Durzî ne, em Elewî ne, em Ermen in, em Suryan in em Erebin, em ji Rojhilata Navîn in û welatparêz in. Bi rastî jî hê ne doh bû ku li Bendava Tişrînê, me, zarokên xwe, hunermendên xwe şehîd dan. Ne guleyeke di şeveke tarî de tê ruhê mirov distîne. Çeteyên har di nava rojê de bombe barandin ser zarokên me. Her roj zarokên me li çiyayên Kurdistanê bi çekên kîmyawî tên xeniqandin. Li beravên Sûriyê em bi hezaran Elewî hatin qetlkirin, em bi dehan Durzî bûn hedefa guleyên DAIŞ’a nû, guleyên wan li bedenên me hêlîna xwe çêkirin. Ji ber wê, êşên me pir giran in û bê tarîf in. Eger em wekî mirovekî adî yê cîhanê bi pey êşên xwe bikevin, em rojekê jî najîn. Dilê me ji cîhanê reş dibe. Tenê em welatparêzên Kurd, me di van çend salên dawî de hindî êş dîtin, em kêliyekê jî ji hezarî yekê van êşan bikolin, em nikarin rojekê jî li vê cîhanê bijîn. Mîna wî mirovê ferişteyê aştiyê hemû demarên dilê me wê bihelin.

Ya din jî em welatparêzên neteweya demokratîk li ber destê Rêber Apo mezin bûne. Em dizanin ku şehîd hêza herî zindî ya jiyanê ne. Hêza jiyanê çi dike? Jiyanê çêdike. Jiyan bi xwe jî heqîqet e. Rêber Apo şehadetên destpêkê yên gelê Kurd wisa pênase dike; “Ew bûne pira di navbera mirin û jiyanê de; rêya di navbera mirin û jiyanê de hêsantir kirine.” Ji ber ku mirin û jiyan, wekî ku Rêber Apo dibêje, ji aliyê şehîdan ve hate gihandin hev, ji wan şehîdan bi şûnde Kurdan tirsa ji mirinê ji holê rakirin. Êşa ji ber şehîdan dihate kişandin, ji êşên ji rêzê cuda bû. Ji ber wê yekê ye ku welatparêzên Apocî li ser şehîdên xwe nagirîn. Dayik bi tilîliyan şehîdan pêşwazî dikin; gelên neteweya demokratîk, bi çepikan şehîdan pêşwazî dikin.

Vaye ev zanebûna ku êşa dilê me ya ji ber nebûna Sırrı Süreya Önder, aram dike. Nexwe ew ê rondikên çavên me bibûna mîna ava Firatê, xwe li çiyayê Nemrûd bidana. Wê demê ti bendavan nedikarî xwe lê ragire. Jixwe wî jî ji me ev nedixwest.

Ji ber ku ew perperîka çaremîn bû. Perperîka yekemîn ji ber têhna agirê aştiyê encax karîbû gav bi gav xwe nêzîkî heqîqetê bike. Nekarî bitebite paşde zivirî... bû qir û qiyamet... axeyên şer û celadên zend û bend badayî, di xwîna gelan ku herikandine de melevanî kirin şev û roj... Ya duyemîn û sêyemîn her wisa encam da... bû qir û qiyamet... axeyên şer û celadên zend û bend badayî, di xwîna gelan ku herikandine de melevanî kirin çendîn dem û zeman...

Lê perperîka çaremîn nêviyê Baba Îlyas, Baba Îshaq, Şêx Bedredîn, Pîr Sultan bû; hevalê Deniz, Îbrahim û Mahir, Srrı Süreya Önder bû; ew hevalê Rêber Apo bû. Heqîqeta aştiyê wekî xewna şevan dûr bû, ji her kesî, ji ferişteyê aştiyê. Ji beriya wî çend perperîkan xwe ceribandibûn, mixabin agirê heqîqeta aştiyê çavên wan kor kiribû û baskên wan şikandibû, bê çare ew paşde vegerîbûn. Lê li ser pişta wî barê heq û heqîqatê, ked û xwîna gelan a dîrokî hebû, diviyabû bigihanda selametê. Bi gotinê hêsan e, ne wisa rehet bû ev rêwîtî. Perperîka çaremîn her ku li fersahan derbas bû, kêlî bi kêlî xwe nêzîkî heqîqetê kir da ku barê xwe yê dîrokî bigihîne selametê, her der bi têhna agirê aştiya heqîqî sincirî. Her ku Sırrı nêzîkî heqîqeta aştiyê bû, destpêke porê wî yê pel bi pelî şewitî. Bêhna kizirî ji çiyê Nemrûdê xwe berda çû dûr, tevlî ava Firatê bû. Paşê serê tiliyên wî şewitî... herî dawî hemû demarên dilê wî heliyan, ew dilê wî yê mezin bû volqaneke çiyayên ji agir teqiya... Çû di nava dilê tavê de cih çêkir... Barê li ser milê xwe gihand selametê, ew û barê xwe, xwe gihandin heqîqeta agir û aştiyê. Sırrı bû Fenafillah, bû heqîqet, bû tava li azmanan... Hebûna wî ya fîzîkî bû sir û razekê, êdî ti kesê ku ruhê wan di nava laşekî de zindanî be nikare wî bibîne... tenê...

Tenê, eger em bixwazin gewdeyê wî bibînin em ê her sibe li tava nû hiltê binêrin... Ew her sibe ti kes ne li bendê be jî hiltê, bi serbilindî û dema ku diçe ava jî serbilind e Sırıyê me...



# Di 28’emîn bîranîna komkujiya Hewlêrê de, PDK’ê ji hesabxwestinê li ku ye?

Hewlêra Kurdistanî bûye şahidê pilan û sûcên dîrokî yên PDK'ê û Tirkiyê li dijî Tevgera Azadiya Kurdistan û gelê Kurd. Gelo Komkujiya 16'ê Gulana 1997'an li dijî Gerîlayên Azadiyê, rewşenbîr, rojnamevan û welatparêzan wê ji bîr bibe?

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di hemdemiya pêşveçûn û geşedanên ku li ser asta Kurdistanê em îro dibînin de, divê em dîrokên bi agir ji bîr nekin ku di hafizeya Tevgera Azadiya Kurdistan û welatparêzên vî gelê de bûne rojekên reş. Bi tayebt di navbera Tevgera Azadiya Kurdistan û Hikumeta Başûrê Kurdistanê de salên tijî bi pevçûn hene. Yek ji bûyerên ku nayên ji bîr kirin…Komkujiya Hewlêrê sala 1997’an ku tê de 83’ê kes şehîd bûne ye, ji wan 52 Gerîlayên birîndar yên bê çek bûn.

Ev bûyer bi taybet li hember hedefgirtina gerîlayên Tevgera Azadiyê li Hewlêrê pêk hat. Di pêvajoyeke ku PDK’ê û MÎT a Tirkiyê dixwaztin derbe li Tevgera Azadiyê bixistibana. Ev komkujî xwedî serpêhatiyeke bi êş e ku tê de gelek kesên welatparêz û sempatîz jiyana xwe ji dest dan. Heyanî niha jî kesên ku di vê komkujiyê de hatine şehîd xistin, ne diyar e ku cenazeyên wan li ku ne. Li gorî hin agahiyan dibêjin ku bi gorên komî sipartine axê.

PDK’ê û dewleta Tirk a dagirker heyanî vê kêliyê jî tu carî behsa vê komkujiyê nekiriye û di raya giştî de hesab nehatiye xwestin. Malbatên kesên ku di wê komkujiyê de hatine şehîd xistin, heyanî niha darizandina sûcdarên vê tewanbariyê dikin. ji lewra ger PDK’ê vê rojê ji bîr dike, aliyên ku bînin bîra wî… hene.

### Dîrokek ji şerên navxweyî

PDK’ê cara pêşî 1992’an li dijî Tevgera Azadiya Kurdistan bi rengekî aşkere hevkarî bi dewleta Tirk re kir. Piştî vê hevkariyê 3’yê Cotmeha 1992’an PDK bi dewleta Tirk re êriş anî ser Tevger Azadiya Kurdistan. Heta dawiya Cotmehê ev êriş berdewam kir. Piştî vê hevkariyê di navbera gerîlayên Tevgera Azadiya Kurdistan û PDK’ê de 1999’an gelek caran şer derket. Li gel vê PDK di êrişên dewleta Tirk de li kêlek dewleta Tirk cih girt. Di êrişên ser gerîla de hişt ku Tirkiyê bi rihetî di Başûrî Kurdistanê de tevger bike. Piştî ku 1992’an PDK’ê û dewleta Tirk êriş anîn ser gerîlayên PKK’ê şerê navbera PDK’ê û gerîlayan heta salên 2000’î domand. 2000’an piştî ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan biryara veguherîna radîkal stand.

### Binpêkirina agirbestê û pêkanîna Komkujiya 16’ê Gulanê

Di sala 1997’an de dinavbera PKK û PDK’ê de agirbest hebû û PDK’ê gotibû ku ew li dijî gerîlayan alîkariya leşkerên Tirkiyeyê nakin. Lê PDK’ê soza xwe pêkneanî.

Piştî ku PDK’ê soza xwe pêkneanî, her wiha ku di 14’ê Gulana 1997’ê de dewleta Tirk a dagirker bi 200 hezar leşkeran ve êrişek li dijî Gerîlayên Azadiya Kurdistanê pêk anî. Dewleta Tirk a dagirker li benda berxwedana bêhempa ya gerîla nebû. Piştî destpêkirina vê êrişê bi du rojan, PDK’ê di nîva rojê de di 16’yê Gulana 1997’ê di carekê de ji nîşka ve Hewlêr vegerand gola xwînê. Di encama êrişa bêbext ya PDK’ê de 83 hûnermend, rojnamevan, welatparêz, rewşenbîr, azadîxwaz û birîndarên PKK’ê yên bêçek ku tedawî dibûn, şehîd bûn.

çekdarên PDK bi awayeke hemwext hem êrîşê nexweşxaneyê kirin hem jî êrişê Navenda Giştî ya Yekîtiya Netewî ya Demokratîk ya Kurdistanê (YNDK), Ofîsa Navenda Çanda Mezopotamya ya Hewlêrê, Komeleya Yekîtiya Jinên Azad ya Kurdistanê (YAJK), êrişê rojnameyên Welat û Welatê Roj jî kirin û bi çekên giran van saziyan gulebaran kirin. Di êrişên ku li ser van saziyan çêbûne de gelek mirovên



bêparastin jiyana xwe ji dest dan. Êrişên binçavkirin û girtinê ya piştî êrişê dan destpêkirin bi mehan berdewam kir.

tenê de hedefgirtina nexweşxaneyê de 52 gerîlayên birîndar, karmend û welatiyên li nexweşxaneyê hatin şehîd xistin.

Hêjayî bîranînê ye ku di kumkujiya Hewlêrê de 20 kesên rojnamevan ku di Med Tv, Rojnameya Welatê Roj û Roj de kar dikirin hatin şehîdxistin û windakirin.

Rojnamevanên ku di komkujiya Hewlêrê de hatin qetilkirin û windakirin ev in;

1- Mihemed Nadir Gezneyî bi nasnav Xogir, di sala 1970’an de li Hewlêrê hatiye dinê.
2- Azad Mihemed, bi nasnav Kemal di sala 1971’ê de li Rewandizê hatiye dinê.
3- Şiwane Hemelaw, bi nasnav Rêbaz di sala 1971’an de li Silêmaniyê hatiye dinê.
4- Idrîs Elî Mihemed, bi nasnav Azad di sala 1973’an de li Pêncewînê hatiye dinê.
5- Receb Mihemed Salih, bi nasnav Goran, di sala 1971’an de li Kelarê hatiye dinê.
6- Gelawêj Kemal Hesen, bi nasnav Rewşen, di sala 1971’an de li Silêmaniyê hatiye dinê.
7- Yusuf Xalid Necîb, bi nasnav Murad, di sala 1973’an de li Silêmaniyê hatiye dinê.
8- Hamid Berzencî, bi nasnav Kawe, di sala 1973’an de li Kerkûkê hatiye dinê.
9- Îsmaîl Ebdullah, bi nasnav Aram Şeqlawe, di sala 1972’an de li Şeqlawe hatiye dinê.
10- Gelawêj Arif Mehmud, bi nasnav Berxwedan, di sala 1975’an de li Silêmaniyê hatiye dinê.
11- Şêx Kameran Hîranî, di sala 1968’an de li Hîranê hatiye dinê.
12- Perî Osman Mihemed, bi nasnav Peyam, di sala 1973’an de li Silêmaniyê hatiye dinê.
13- Nahîde Hemesalih, bi nasnav Rûken, di sala 1971’an de li Silêmaniyê hatiye dinê.
14- Gunay Geçilmez, bi nasnav Ronahî, di sala 1971’ê de li Pazarcixa Gurgumê hatiye dinê.
15- Mêrxas Serêkaniyê, di sala 1970’an de li Serêkaniyê hatiye dinê.
16- Ronî Melazgirt, di sala 1978’an de li Melazgirtê hatiye dinê.
17- Roza Yusif, bi nasnav Roza Cudî, di sala 1969’an de li Dirbesiyê hatiye dinê.
18- Ciwan Şêxo, bi nasnav Huner di sala 1965’an de li Dêrikê hatiye dinê.
19- Serkewt Xaneqînî, di sala 1972’an de li Xaneqînê hatiye dinê.
20- Bekir Dogan, bi nasnav Numan di sala 1968’an de li Ruhayê hatiye dinê.

# Berxwedana dîrokî ya PKK’ê derbasî qonaxeke nû dibe…



**Zekî Bedran**

Rêber Apo, 27’ê Sibatê bi “Banga Aştî û Civaka Demokratîk” pêngavekê dîrokî avêt. Guhertin û veguhertin dana li pêşîya PKK’ê. PKK da xuyakirin ku li gorî wê bangê tevbiger e. Rêber Apo got ku: “PKK’ê kongra xwe lidarbix e, xwe fesix bike û têkoşîna çekdarî bidawî bik e.” PKK’ê jî daxuyaniyek da û go: “PKK’ê kongreya xwe ya 12’emîn li gorî banga Rêber Apo 5 û 7’ê Gulanê lidarxist.” Di heman demê de jî dan diyarkirin ku di demekê nêz de biryarên kongreyê dê bên xuyakirin. Dibê ku dema ev nivîs hat weşankirin, PKK’ê encamnameya kongirê bi raya giştî re eşkere kiribe. Biryarên ku PKK’ê kongirê de bigire li holê ne. Di wê bingehê de daxuyanîyên ku bên dayin ne ji nişka da bikevin rojevê ne. Bangewazî, li ser bingeha fesixbûna PKK’ê û bidawî anîna têkoşîna çekdarî bû. Bêguman dê biryarên bên girtin jî li ser wê bingehê bê dayin. PKK’ê têkoşîna ku ev nêzî 50 sale dimeşîn e, bigihine merheleyekê din; dê biçe rêxistinbûyin û şêwazên têkoşînê ya nû. PKK’ê û têkoşîna wê winda nabe û ji holê ranab e.

Bi pêşengiya PKK’ê ev berxwedan û rêxistinbûna nîv serdeme ku didome destkeftiyên efsûnî xulikandin.. Li ser vê ezmûna salan, wê xwe ji bo serdema dîrokî ji nûve ava bike. Ev guhertin û veguhertineke mezin hewce dike. Dema ku gelê Kurd û rêxistinên wan di nav guherin û veguhertinê de ne, Tirkiye û herêm nikarin wek xwe bimînin. Tirkiye jî di nav guhertin û veguhertinê de ye. Di warê siyasî û mafnasî de jî divê dewleta Tirk ji bona pirsgirêka Kurd gavên berbiçav bavêje. Ger dewlet bibe dewleta Kurdan, wê dev ji înkar û tinehesibandinê berde û veguherîneke zanistî û zagonî bike. Ger pêvajo were têkbirin an paşvekêşandin, eşkere ye ku dê hawîrdorekê aloz û şer pevçûn bêguman vegere. Rêber Apo berpirsyariyeke dîrokî girt li ser milê xwe. Di dema niha de, hikûmeta AKP’ê gavên cidî neavêtiye û ti guhertinên zagonî nekiriye, Rêber Apo berpirsyariya fesixkirina PKK’ê û dest ji têkoşîna çekdarî berdan digire li ser milên xwe. Yên ku Tirkiyeyê bi rêve dibin, wê girîngî û dîrokîya vê yekê fêm bikin û li gorî wê tevbigerin, em nizanin. Daxuyaniyên wan ên heta niha erênî ne. Lê em ê temaşe bikin û bibînin ka tiştên ku têne gotin dê tenê gotin bimîne an dê bêne kirin?

Ger dewleta Tirk li Bakurê Kurdistanê bi Kurdan re aşitiyê bike û hebûna wan bipejirîne, ev yek bi awayekî xwezayî bandorê li beşên din jî dike. Wê herî zêde Rojava Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji vê yekê bandor bibe. Ji ber ku xebat, berxwedan û rêxistinbûna li vê herêmê di bingehê xwe de ji raman û têkoşîna Rêber Apo hatiye avakirin. Em qala herêmeke ku Rêber Apo 20 salan têda têkoşîn û xebatên rêxistinî meşandiy e. Dewleta Tirk jî ji bo şikandina bandora Rêber Apo û ji holê rakirina destkeftiyên şoreşê, êrîş, dagirkerî û tifaq bi çeteyan re pêk anî, bênavber û bi gelek awayan xebitî. Li Rojava şerekî dijwar û dorpêç hebû. Dewleta Tirk her tim ji van êrîş û polîtîkayên xwe re têkoşîna li dijî PKK’ê û terorê bi nav dikir. Di rewşeke ku PKK hatiye tasfiyekirin û têkoşîna çekdarî hatiye bidawîkirin de, dijminatî û êrîşên wan ên li dijî Rojava êdî ti hincet namîne. Ger li Tirkiyeyê zagona biratiyê ji bo kurdên Tirkiyê bi cih bîne, israra wî ya di dijminatiya kurdan a Sûriyê da tu wateya xwe namîne. Ev xwezayî ye; Divê Tirkiye vegere siyaseta lihevkirin û biratiyê ya bi Kurdên derve re.

Di projeya Rêber Apo de berdewamkirina çareseriya li Tirkiyê û li parçeyên din jî heye. Armanca wê Yekîtiya Demokrat a Kurdistanê ye. Yanî armanc avakirina yekîtiyeke demokratîk e, ne dewlet û federasyoneke cuda ye. Ev çareserî di berjewendiya dewletên din de jî ye. Pirsgirêka kurd êdî wê li herêmê nebe mijara nakokî û pevçûnan. Rêya aştî û veguherîna demokratîk ji herêmê re wê vebe. Li vir jî windaker nînin, her kes bi serdikeve.

Di çareseriya Rêber Apo de demokratîkbûna Rojhilata Navîn jî heye. Lê em nizanin ka dê rê li ber vê çareseriyê vebe yan dê Tirkiye vegere rewşa xwe ya tê zanîn. Li Sûriyê dewleta Tirk Kurdan weke hêzeke hevalbend nabîne. Dewleta Tirk xwe daye milê HTŞ’ê û ew hilbijartiye. Bi mehan êrîşî Tişrîn û herêmên din kir. Armanca wê ew bû ku hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bike û xweseriyê ji holê rake. Ne diyar e ku ji niha û pê ve dê helwesta xwe biguherîne yan na.

Ji ber ku niha êrîş rawestiyane û nermbûnek çêbûye, divê Rêveberiya Xweser û hêzên şoreşger bêzar nebin. Ji ber ku Tirkiye komên çekdar û çeteyên ku di bin navê SMO de kom kirine belav nekiriye. Şêniyên Efrînê hê jî nikarin vegerin warên xwe. Tirkiye bi dewletên herêmê re ji bo ku QSD’ê û xweseriyê bihêle, bi hêzên weke DYA’yê re danûstandinan didomîne. Di vî warî de hem rêveberî û hem jî gel divê hêza xwe ya parastina cewherî xurtir bikin û ji hemû geşedanan re amade bin.

# Partiya Karkerên Kurdistan



**Farûk Sakik**

Bi biryarên kongreya 12’emîn a PKK’ê, têkoşîna Kurdan derbasî qonaxeke nû bû. Em li bersiva ji kîjan qonaxê derbasî kîjan qonaxê bû, bigerin.

Dema ku di sala 1978’an de ev partî hat damezirandin, polîtîkayên dewleta Tirkiyê yên îmha, înkar û asîmîlasyonê derketibû asta herî jor. Ev siyaseta wan nêzî hedefa xwe bûbû.

Heger ev tevger di wê serdemê de, midaxleyî vê siyaseta dewleta Tirk nekira, wê di sala 1981’ê de polîtîkayên dewletê encam bigirtina.

Çima 1981?

Salek berê dı 12’ê Îlona 1980’yî de darbeyeke leşkerî çêbûbû û di hedefa wan de fînala tunekirina Kurd û Kurdistan hebû. Darbeyê her çiqas hemû çepgir, şoreşger girtibe armanca xwe ya bingehîn Kurdistan bû.

Çima Kurd û Kurdistan? PKK’ê bi avakirina xwe di demek kurt de li Kurdistan belav bûbû. Di wan salan de Kurdbûna Kurdan bibîra wan xistibûn. Piştî demekê jî amadekariya şerê Gerîlatiyê kiribûn. Li Lubnanê perwerde bûbûn û vegeriyabûn welat.

Di vegerê de pêşeng û fermandarên şerê gerîlatiyê Mazlûm Dogan û Kemal Pîr hatin girtin. Efektên van xebatan bala dijmin jî kişandibû. Dewlet ji bo vê yekê li zîndana Amedê dest bi hovîtiyek mezin kir.

Armanca darbekaran çibû? Di şexsê van pêşengên PKK’ê de dixwest Kurdiyetî bi pêş nekeve. Ji nû de vejîna Kurdan pêkneyê.

Lê li zindana Amedê berxwedan bû jiyan. PKK’ê jî li derve ew şerê gerîlatiyê ku di dawiya salên 70’yî de di nivî de hiştibû, ji nû de birêxistin kir. Di 52 salan de çibû?

Di encama vê têkoşîna 52 salan de PKK’ê siyaseta înkar û îmhayê ya li ser gelê Kurd parçe kir, pirsgirêka Kurd bi rêya siyaseta demokratîk anî noqteya çareseriyê, hebûna gelê Kurd da qebûlkirin û pirsgirêka Kurd weke realîteya bingehîn a Tirkiyê da qebûl kirin. Doza Kurdistan derbasî platformên navneteweyî kir. Li ser vê bingehê li ser navê gelê Kurd şoreşa vejînê pêkanî.

Di kongreya 12’emîn çi biryar hat girtin? Rêber Apo banga Aşitî û civaka demokratîk kiribû. Kongreya PKK’ê ya 12’emîn a Awarte bersiva vê bangê bû. PKK ev esas girt ji bo aşitiyê, biryara bi dawîkirina rêbaza têkoşîna çekdarî da û bi civaka demokratîk partiya xwe fesix kir, da ku bi riyên demokratîk doza xwe bidomîne.

Piştî biryarên Kongreya 12’an wê çibibe? Ev pêvajo ji aliyê Rêber Apo ve tê birêvebirin. Rêber Apon di pêvajoya hevdîtinan de tu carî bazariyan nake. Nabêje piştî vê biryarê bila ev gav bê avêtin, an jî piştî hewldanek dewletê, rêxistin jî van gavan bavêje. Xwedî nexşerêyek e. Bi paradîgmaya xwe, pêşî li astengiyên li pêşiya çareseriya pirsgirêka vedike. Behsa serkeftinan an jî ji kêmasiyan raboriyê zêdetir, behsa pêşerojê dike. Ew pêşerojê analîz dike û perspektîfan jî li gor wî pêşniyar dike. Ji bo pêşerojê çi pêşniyar kir? Divê heger me îmha, înkar û asîmîlasyon heta kongreya 12’an da seknandin, êdî ji bo mîsogerkirina doza Kurdistanê, em ê têkoşîneke demokratîk bidin destpêkirin. Ji bo pêşvexistin û mezin kirina van destkeftiyan, ji nû de birêxistin bibin. Berê çawa ji nav civakê, bi tevlîbûna nav refên gerîla, dibûn parçeyek vê têkoşînê, îro şûn de jî bi tevlîbûna nav xebatên demokratîk, wê bibin parçeyek ji vê têkoşîna serdema nû. Ji bo vê yekê Rêber Apo ev wek civaka demokratîk bi nav kir. Divê saziyên nû, kom, meclîs, komele, ensîtutî hwd. Werin avakirin û di xebatên parlementeriyê de jî derbasî merheleyeke nû bibin.

Tiştek din dike, ji bo destketiyên Kurdan careke din nebe qûrbana berjewendiyên desthilatan, israra misogerkirina di qanûnan de dike. Çima ‘PKK’ê romaneke dawî lê nehatiye’?

Kurdistan azad bibe jî ji bo parastina vê azadiyê wê têkoşîna xwe bidomîne.